# Jîn

Jimara pêncê | Heyva Êlulê 2006 | Vercinye, Emrîke | perê - 1

Ez gelek ḧe ji xêzana xu dikim. Deyk u babêt min şî bi êk u dû kirî ne eve ji 48 sala were. Birayê min u jina wî jî eve ji 20 sala were şî bi êk u dû kirî ne u sê biçîk hene. Ez u xoşka min ne şîkirî ne. Em rêzê li êk u dû digirîn u digel ta'etî bu Xwidê dikîn.

Belê ne ḧemî xêzanek bi keyf in. Meta min jî şî bi êkê kir, jina wî mirî bî u sê biçîk hebîn. Dîar bî ewan jîanekî xuş hebî, belê ne rast bî. Mişkîlek (kêşeyek) hebî: Mêrê wê bi dizîkî ve xîanet lê dikir. Belkî zinayê ne dikir, bes wî bi hewesê/dilê xu gelek cara wesa kir. Piştî bîst sala li gel êk u dû maîn ewî meta min hêla çunku ne şîa bi gunneha zinayê bijît. U divîa biçit gel hevala xu bijît bi gunnehî ku demê ewî mal u jin hey. Meta min wêran kir u mala me şerim kir. Her dû kurrêt wî dîf nimûna babê xu çûn u bi gunnehî jîan. Her dem gunneh dîmahîa xirab heye.

Xwidê şîkirin navbeyna êk jin u êk zelam bu jîana wan ḧemîê çêkir. Bes mirin dişêt wan ji êk u dû vekit. Xwidê digel me rast e u guhê xu dit me u ḧe ji me dikit ḧeta heker em ne hêja ne. Xwidê divêt em gel Xwidê u êk u dû rast bîn.

Belê wextê em gunneha dikîn – bi nimûne, heker em dehmen pîsî bikîn – u heker em gunneha xu aşkira bikîn u heker em li gunneha xu bizivirrîne ve, Xwidê bi reḧm e u li me diburit.

## Daûd Paşaî

Daûd pêẍember, ku jî paşayê Îsraîlê bî, bi dizîkî ve dehmen pîsî kir. Wextê zanî ku ew jin bi ḧal bî, Daûd bi dizîkî ve mêrê wê kuşt, u paşî ew jin bu xu îna. (Gunnehêt aşkira ne kirî her dem têne hêş pitir gunneha!) Xwidê kurrekê wan bi saxlemî kir, u Daûdî bawer kir ji gunnehêt xu xilas bî.



Daûdî bi dizîkî ve gunneh kir, belê Xwidê ḧemî tişt dizanit u karêt Daûdî jî zanî. Çunku Xwidê ḧe ji Daûdî kir, pêẍemberek dî (navê wî Natan bî) hinarte def wî da rîberî bikit. Gutê:

"Dû miruv li bajêrekê jîan. Êk ji wan dewlemend bî, u yê dî dest teng bî. U yê dewlemend kerêt pezî u garanêt çêla hebîn, belê yê dest teng ji kavirekê zêdetir ne bî ew jî yê sava bî, ewî kirî u guhê xu dayê u li gel wî u kurrêt wî mezin bî, ji xwarina wî dixwar u ji vexwarina wî vedixwar u di kuşa wî da dinivist, dê bêjî eve kiça wî ye. U paşî mêhvanek hate def yê dewlemend, u ewî we ne kir ji pezê xu yan ji garana xu bu mêhvanî ser jê bikit, belê gavirê yê hejar dizî u bu wî amade kir."

Hîngê Daûd gelek turre bî li ser ewê dewlemend u gute Natanî, "Xudan yê sax e, ewê we kirî hejî mirinê ye u divêt ew çar cara temet hindê bidite yê hejar. Çunku ewî ew tawa ne kir u diluvanî ne kir."

Îna Natanî gute Daûdî, "Tu ew zelam î!! U eve ewe ya Xudan dibêjit: Min tu hilbijartî daku bibîne paşayê Îsraîlê u min tu ji destê dujminê te qurtal kirî u min mala xudanî te u jinkêt wî dane te. U min tukrîe paşayê Îsraîlê u heker eve piçek ba, ez da pitir dime te. Vêca te buçî peyva Xwidê rezîk kir, u te xirabî pêş wî kir te mêrê wê bi şîrê 'emunîya kuşt u te jina wî mehir kir? Te ez xurî kirim."

Daûdî aşkira kir, "Min gunneha di derheqa Xwidê da kir." Xwidê lê burî, belê dîmahî eve bî – kurrê wan mir. Daûdî mirna biçîkê xu qebîl kir çunku ew zanî ku Xwidê baş e u bi dadperwer e u diluvan e. (U Daûdî jî zanî ku ew xu şîa bimirit çunku ew êk e ku dehmen pîsî kir bî u kuşti bî.)

Piştî hîngê Xwidê kurrek dî da Daûdî u jina wî, navê wî Silêmanî bî. Xwidê gelek ḧe ji Silêmanî kir, u ew jî bî pêẍember u paşayê Îsraîlê yê dî.

Piştî 900 sala 'Îsa pêẍember - ji binemala Silêmanî – eve he gut u beḧsa dehmen pîsî kir:

"We ya guh lê bî, ku ya gutî: zinayê ne ke. Belê ez dibêjime we her kesê bi çavekê xirab seḧkite jinkekê, zina di dilê xu da digel wê kirî ye. Heke çavê te yê rastê bî egera gunneha, bîne derê u pavêje. Bu te çêtir e parçeka leşê te kêm bit, ne ku hemî leşê te di duzexê da bête sutin. U heke destê te yê rastê bibîte egera gunneha, wî destî bibire u pavêje. Çêtir e bu te parçeka leşê te kêm bit, ne ku hemî leşê te di duzexê da bête sutin."

- Mizgînî ya Mettî 5:27-30

"Jîn" guvareke tête nivîsîn ji laê Şirînê. Heker te jimara guvarê bivêt, îmêla xu bu min virêke: jeenuazadi@cs.com
© 2006 by Şirîn. All rights reserved. This publication may not be sold, except by the author. It is for free distribution only.

# Azadîa rastî çi ye?

Li ser wan evêt bawerî dayê, berî ḧemî tişta, ew di dest pak bin. Bawerî êk ji pitir tiştêt zeḧmet e da bînit ve hevaletî piştî berze kir. Bawerî têt înan ji qadirê miruvekê ji ber navdarîek baş u bawerî jî têt înan ji ber beḧsa başî. Bawerî dişêt zî berze bikit ji ber xapandin, bi nimûne dehmen pîsî kirin yan drew kirin. Dişêt berze bikit ji ber karêt ‘ecêbî yan leşîn. Bawerî berze dikit wextê êkê bi devê xu cîranê xu bi axiftinêt aştê diaxivit, belê di dilê xu da ewî bustek ya bu vedaî.

Heker te şula xu veşart yan dilê êkê êşand, pêtivî ye tu aşkira gunnehê xu bikî u tube bikî. Heker êkê şula xu veşartî yan dilê te êşa, pêtivî ye tu wan biburî. U paşî pêtivî ye tu ḧe ji wan miruva bikî. Ḧeskirin bu bawerîa berze dermanê dijî jehrê ye. Ḧeskirin ḧemî tişta diparêzit u ḧemî tişta bawer dikit u her bi hîvî ye u xu li ber ḧemî tişta digirit, u çi cara wêran nabit.

Heker tu ne şêî rêkêt xu bi xu biguhurrî – heker tu ne şêî li miruvêt dî bi xu biburî – pêtivî ye tu ji Xwidê bixazî da harî karîa te bikit. Xwidê xuştivî ye, u ewê di xuştivîê da xu ragir bit, digel Xwidê xu ragir dibit u Xwidê digel wî xu ragir e.

Miruv dê her dem hîvîêt me şikênit çunku miruv gunnehbar in. Belê Xwidê baş e. Li roja tengavîê kelh e u ewan nasdikit ewêt xu yê digirin. Belê ew dest bi pakîyeka dirist dîar bikit.

Heker te gunneh kir – u ji ber hindê azadîa dilê te naêt – pêtivî ye we bike wekî Daûd pêẍember we kir: Aşkira gunnehê xu bike. Du’akirna Daûdî wextê ew aşkira gunneha dehmen pîsî u kuştinê kir bixwîne. (Ew çîroke li ser perê êkê ye.)

“Ey Xuda, bi gureî diluvanî ya xu diluvanîê min bibe, u bi gureî dil nêzikî ya xu gunnehêt min ne hêle. Min bi êk carî ji gunnehêt min bişu, u min ji gunneha min tafîr bike.

Ez aşkirayê bi gunnehêt xu dikim, u gunneha min her dem li pêş çavêt min e. Min di derheqa te tinê da xeletî kir, u xirabî li pêş çavêt te kir, daku demê tu xukimî dikî. Tu xukimî bi dadperwerî vebirî, u demê diaxivî rast bêjî.

Eve ez bi gunnehê ji dayk bîm, u bi gunnehê deyka min bi tişt keft. Eve te divêt tu rastîê dinav xûî ya miruvî da bibînî, u danayîê di deruna min da nîşa min bidî.

Ey Xuda, dilekê paqij dinav min da çêke, u gîaneka rast dinav min da nî jeng bike. Tu min ji xuzîra xu der ne êxe, u Gîana xu ya pîruz ji min ne stîne. Xuşî ya min bi qurtalîa xu li min vegerîne, u bi gîanê pişta min bigire. Hîngê dê gunnehbar rêkêt te zanin, u yêt gunnehkar dê pêşeman bin.

Ey Xuda, tu min ji riştina xwînê biparêze, ey Xudayê qurtalkirina min, u dê ezmanê min bi rastîê u başîa te velurînit. Ey Xudan, lêvêt min veke, u devê min dê beḧsê supasîa te kit u belav kit.

Tu bi çi gurîa keyf xuş nabî, heker ez da pêşkêş kim, u bi çi sutîa razî nabî. Ew gurîêt Xwidê dixwazit, ew gîanêt şikestî ne, u dilê şikestî çepel ne kin, ey Xuda.”



- Zebura 51:1-6, 10-17

> **Ey Xuda, dilekê paqij dinav min da çêke, u gîaneka rast dinav min da nî jeng bike.**
>
> - du’a Daûd pêẍember

# Serhatîa Jinka Dehmenpîs

‘Îsa çû li peristgehê [cihê dadkirnê], u gelek cemawer li dur xu bû, u rînişt u ew fêr dikirin. U mamostayêt desturî u ferîsîya [rêberêt dînê] jinek bi dehmenpîsîê girtibî îna nik u li nîva wan rawestand u gutine wî, “Mamosta, ev jinike diber mêrkekî ra razaî ya hatî ye girtin. U Musaî di desturê da ferman ya li me kirî ev jinkêt van kara dikin bi berde barankirnê bêne kuştin. Tu çi dibêjî?”

Ev pisîare jê kir da wî tengav bikin u hêceteкê peyda kin wî pê tawanbar bikin.

Belê wî xu çemand u bi tibla xu li ser ‘erdî dinivîsî. Belê wan her pisîar jê kire ve, vêca xu rast kir u gute wan, “Ew kesê dinav we da yê bê gunneh bit, bila li berahîê berekî danitê.” Careka dî xu çemand u li ser ‘erdî dinivîsî.

Demê wan guh li vê axiftinê bî, êk li dîf êkî çûn u berahîya hemîya rihspî, u ‘Îsa bi tinê li wêrê ma, u jinik di cihê xu da ya rawestaî bî.

Xu rast kir u gute wê, “Jinê, kanê ne ew? Kes ji wan dad li ser te ne kir?” Bersiv da, “Ne xêr ez xudam.” Gute wê, “Ezê jî te dad nakim. Herre u gunneha ne ke ve.”

- Mizgînîa Yuḧennaî 8:1-10

## Destur:



## Çakî:




© 2006 by Şirîn. All rights reserved. This publication may not be sold, except by the author. It is for free distribution only.

# Îmêlêt We

Şirîn,

Supas bu karê te; karekî gelek baş e. Ez gelek ĥe jê dikim. Ez dê li vêrê bu ĥemî nas dikim belave kim.

Silava li ĥemîa bu min bike.

Supas.

M.

Supas!

G.

Şirîn,

Keyfa min hat wextê min îmêla te wer girtî. Bu hindek heyva ez bi şul bîm u min îmêla xu venekir da caba te bidim. Keyfa min têt wextê tu îmêla xu bu min virêdikî.

Min pisîara hevalêt xu li vêrê kir – beĥsa programa Inglîzîa te – u gut min evê havînê tu venakî. Ez bê hîvî mam. Bi xu heker tu programa xu li Dihukê yan li Hewlêrê vekî, ez ĥazir im bêm, u dê keyfa min êt heker te gut min dê vekî.

M.R.

Zor supas, Şirîn.

Silav bu te u B.

A.

Çawan î Mamosta.

Ez xwêndikara te bîm. Tu çawan î? Hîvî dikim tu baş bî.

Mamosta, ka bu min guvara te “Jîn” virêke.
Bi xatra te.

B.

Çawan î Şirîn.

Hîvî dikim tu gelek baş bî.

Min “Jîn” wer girtin. Gelek memnun.

B.

Supas bu jimara #4.

B.

Çawan î Mamosta Şirîn.

Ez xwêndikar im ji Dihukê u bu dû sala ez li programa Inglîzîa te ya havînê bîm. Sala ‘ewilî mamosta min Emîra bî u sala dûê mamosta min Kêtî bî. Ev sala sala dîmahîkê yê kulîê. Min divêt ez xwêndikara te u hevala te bim.

Min divêt ez tiştekê bêjim te, beĥsa “Jîn” dikim. Ez ĥe jê dikim u ew bifêde ye. Xwezî ka pitir babet heban wekî zanistê u risimî. Derbarê kesêt navdar binvîse.

Hîvî dikim her car “Jîn” bu min virêkî. U supas. Hîvîa Xwidê dê jîana te serkeftî bit u taybetî nivîsandina te ya “Jîn”.
Xwêndikara te u hevala te,

B. li Dihukê

Çawan î!

Evro ji berî min îmêl dîtin, min hizira xu kir ku te hêş jimara 4 ne virêkirî, belê demê min vekir, min dît. Gelek supas. Berdewam be li ser karê xu.

Ç.A.

Şirîn,

Silav. Baş e, bes buçî tu kumela Kurdî naxwînî? Li hîvîa serkeftinê bu te dikim.

Nivîser,

S.

Şirîn, çawan î.

Ez H., sayiqê te bîm. Zeĥmet ne bit bêje min tu çawan î u hîvî dikim tu baş bî.

Bila min hindek pisîar ji te hene heker te wexit heye.

Selam,

H.


© 2006 by Şirîn. All rights reserved. This publication may not be sold, except by the author. It is for free distribution only.

# Jîn



## Lêgerran: Pêxuşî

| ' | A | B | C | Ç | D | E | Ê | F | G | H | Ḧ | I | Î | J | K | L | M | N | O | P | Q | R | S | Ş | T | U | Û | V | W | X | Ẍ | Y | Z |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 | 10 | 11 | 12 | 13 | 14 | 15 | 16 | 17 | 18 | 19 | 20 | 21 | 22 | 23 | 24 | 25 | 26 | 27 | 28 | 29 | 30 | 31 | 32 | 33 | 34 |

Pîta lê bigerre u gutina Kurdîê binvîse. Pîtêt pêkhatin bi her hijmarê binvîse:

__________ ________ _____ __________ ________
26 + 13 + 23 + 8 + 26   21 + 14 + 23 + 8   3 + 7 + 23   16 + 27 + 5 + 16 + 8   21 + 14 + 23 + 8

________ _ ____ _______ ________.
31 + 27 + 25 + 26   7   15 + 13   18 + 2 + 17 + 2   18 + 14 + 23 + 14

## Miruvêt Te

[Peyvêt miruva li bin her wênê binvîse.]




*[Bersiva van yarîa li guvara meha bêt dê ête belav kirin.]*


© 2006 by Şirîn. All rights reserved. This publication may not be sold, except by the author. It is for free distribution only.

## Peyvêt Kurdî Berambera Inglîzî: Miruv

### XWARÊ ↓

**2** mêr ; zelam
**3** bîk
**4** bira
**5** pîr
**8** kurr
**9** tî ; mêrê xoşk ; hevlîng
**10** nevî
**11** xezîr
**13** zirbab
**14** jinbab
**15** xoşk
**16** deyk
**18** mêhvan
**20** kurrê bira ; kurrê xoşk
**22** biçîk
**23** dezgir
**24** kiça / kurrê mam ; kiça / kurrê met ; kiça / kurrê xal ; kiça / kurrê xalet ; pismam ; dutmam

### BERAMBERÊ →

**1** bab
**6** deybab
**7** jin
**9** zava
**10** bapîr
**12** zava
**16** xesî
**17** diş ; jinbira ; jintî
**19** bîk
**21** xal ; mam
**25** kiç
**26** xalet ; met
**27** heval
**28** kiça bira ; kiça xoşk

# Family










"Jîn" rujnameke têtе nivîsîn ji laê Şirînê. Heker te jimara rujina bivêt, îmêla xu bu min virêke: jeenuazadi@cs.com
© 2006 by Şirîn. All rights reserved. This publication may not be sold, except by the author. It is for free distribution only.

ji meha burî:

## Bersiva Hewes

| | | | | | | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Ş | N | Î | E | U | E | U | N | T | Ħ | Q | W | E | E | M |
| A | E | D | K | Y | R | G | I | E | E | E | Y | Ê | R | N |
| Ş | Ş | Î | J | E | F | B | A | U | S | R | E | E | I | E |
| Î | U | B | Y | N | N | Ç | Î | T | Î | H | B | Î | H | Q |
| T | ‘ | H | D | X | H | Î | Î | A | D | K | Ê | L | E | N |
| Î | Ẍ | E | E | A | D | A | H | I | Î | R | S | I | Q | S |
| Ħ | M | R | Ç | D | E | I | T | Î | I | R | E | D | R | L |
| D | Î | I | S | E | N | Î | M | R | E | Ş | R | I | Y | H |
| B | R | F | Ẍ | R | B | E | Î | E | I | ‘ | U | J | Ş | X |
| H | Î | N | D | E | Î | G | M | B | R | M | B | B | N | Ê |
| D | N | I | L | I | B | N | I | F | I | D | E | N | E | Ħ |
| E | R | H | I | E | Î | N | Î | R | B | Ş | R | N | N | N |
| D | B | Ê | H | Î | V | Î | F | D | T | L | S | L | D | T |
| L | Ş | B | Î | D | ‘ | E | S | E | B | Î | D | I | Î | Ş |


sil / turre


‘ecêb girtî


bêhin fireh


têr


hizir


qehir


keyfçî


‘esebî


birsî


têhnî


ji dil


beẍimî


ne difin bilind


hîvî


bê hîvî


xerîb


keyf xuş


ħesîdî / kerb u kîn


ser u ber


bê ser u ber


lêkdaî


ne lêkdaî / bergile


mirtaħ / reħet


ne mirtaħ


merd


westîa


şermîn


keyf


mendehuş / şaş


ħeyrî



© 2006 by Şirîn. All rights reserved. This publication may not be sold, except by the author. It is for free distribution only.

# Elif Bê

’ **‘**Îraq 

A, a **a**gir 

B, b **b**erx 

C, c **c**ami’ 

Ç, ç **ç**av 

D, d **d**ersuk 

E, e **e**nişk 

Ê, ê **ê**xtîar 

F, f **f**êqî 

G, g **g**ul 

H, h **h**eyv 

Ḧ, ḧ **ḧ**êştir 

I, I **I**stralîe 

Î, î **î**prax 

J, j **j**ijî 

K, k **k**iras 

L, l **l**eymîn 

M, m **m**eymînk 

N, n **n**ubedar 

O, o **o**de 

P, p **p**aîsigil 

Q, q **q**elew 

R, r **r**îvî 

S, s **s**ister 

Ş, ş **ş**eh 

T, t **t**emate 

U, u **U**rdin 

Û, û **û**têl 

V, v **v**exwarin 

W, w **w**erîs 

X, x **x**îar 

Ẍ, ẍ **ẍ**arîfk 

Y, y **Y**unan 

Z, z **z**irrna 

“Jîn” rujnameke tête nivîsîn ji laê Şirînê. Heker te jimara rujina bivêt, îmêla xu bu min virêke: jeenuazadi@cs.com
© 2006 by Şirîn. All rights reserved. This publication may not be sold, except by the author. It is for free distribution only.

# Jîn



# Mal u Heval

| | | | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Te çend xoşik u bira hene? | Wextê Xwidê biçîkekê dit, hîn dê çawa pîroz kin? | Şulê birayê te çi ye? | Te çend mam u met hene? | Tu çend ezmana dizanî? | Çend miruv digel we dijîn? | Te şî bi pismamê xu kir? | Te dutmama xu îna? | Te çend xoşik hene? | Şulê te çi ye? | Tu çend ezmana dinivîsî? | Her roj tu çend se'eta diçî şulê / medresê? |
| Tu çawa diçî şulî? | | | | | | | | | | | Navê babê te çi ye? |
| Heker êk mir, hîn çi lê dikin? | | Çawa hevalê/a te dê zanit tu ȟe jê dikî? | Şulê xoşka te çi ye? | 'Îdêt we kengî ne? Kîşk roja? | Te çend heval hene? | Tu çend ca dixwî li met'emê? | Tu diçî kîşk medresê? | Te jin înaî? / Te şî kirî? | Deyk u babê te sax in? | | Kîş xwarin xuş e? |
| Te miruv li Mîsilê hene? | | Kîş xwarin ne xuş e? | | | | | | | Şulê deyka te çi ye? | | Dezgirê te çawa bî? |
| Li kîve Xwidê biçîk didit? | | Çend miruv li mala te ne? | | | | | | | Kî li mala te amana dişot? | | Her sal tu çend roj diçî bêhin vedanê? |
| Tu çawa diçî medresê? | | Her roj tu çend se'et şul dikî? | Tu çi dikî li bêhin vedanê? | Tu çend ezmana dixwînî? | Xanîê we çend mezel hene? | Her ȟeftîa tu çend roj şul nakî? | Her roj wextê tu şul nakî, pa tu çi dikî? | | Li gel kîşk miruva tu şul dikî? | | Tu çend ca dê çî mala hevalê/a xu? |
| Tu li kîve şul dikî? | | | | | | | | | Şulê deyka te çi ye? | | Te çend bira hene? |
| Daweta te çawa bî? | Tu di gel çend miruva şul dikî? | We çend dujmin hene? | Şulê bapîrê te çi ye? | Wextê te jin îna / şî kir, 'emirê te çend bî? | Wextê tu bêhin vedana xu wer digirî, tu çi dikî? | Heker deyk u babêt biçîkekê dimirin, kî dê wî bi xudan dikit? | Şulê mamê te çi ye? | Çend ca hevalê/a te têt mala te? | Te çend xal u xalet hene? | | **Dest pê bikin.** |

**Xilas bî!**

*Ev yarîa he bi zalê tête kirin li navbera dû ȟeta şeş kesa. Ew kesê zalê dihavêt dişêt çend jimara zalê hind çar guşa biçit. U caba pisîara bide da hîn êk u dû pitir nas bikin.*

© 2006 by Şirîn

# Mala Kurdî

Ev wêne dirist kirin ji laê wêneçêkerekê ji bajêrê Zaxo, Kurdistana ‘Îraqê, 1993.




© 2006 by Şirîn. All rights reserved. This publication may not be sold, except by the author. It is for free distribution only.